# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 942 | 16-Sibat- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî




**Navnîşan**

www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني


## Kurt û Kurmancî bi dawî bû

**Festîvala Filmên Kurt û Kurmancî ya li ser malpera sinemayakurdi.net bi rê ve çû û bi dawî bû.**




Festîvala Filmên Kurt û Kurmancî a li ser malpera sinemayakurdi.net bi rêve çû û niha bi dawî bû. Di nav mehekê de li filmên ji bo festîvalê hatibûn neqandin, li ser malperê hatin temaşekirin û filmên herî zêde deng girtin, xelat girtin. Festîvalê li ser malpera sînemayakurdî.net daxuyaniyek kurt belav kir û filmên xelat girtin eşkere kirin. Festîvalê di daxuyaniya xwe de got, "Em ji bo temaşevan û filmçêkeran dibêjin, mala we ava ku we mehekê ev filmên kurt û kurmancî li hemû quncikên cîhanê belav kirin. Bi xêra we li her devera cîhanê xelkê berê xwe da van filmên kurt û bi mane."

Di dawiya dengdayînê de filmên xelat girtine jî wiha ne;
- Xelata Sînemaya Amûdê
Êdî Bêyî Tirs-Ridwan Diharo (2017 deng girtin)
- Xelata Taha Karîmî
QWX-Nurullah Akcan (1949 deng girtin)
- Xelata Xelîl Dag
Hişê Zarok-Firat Yavuz (1714 deng girtin)
- Xelata Taybet ya Kurdîstanî
Li Malê-Xelîl Akgul (1358 deng girtin)

***Ozgûr Polîtîka***

## Heskirina jidil

**Cupoty Challenge (Close-up Photographer of the Year) ku her sal wêneyên herî baş ên ji nêz ve hatine girtin dineqîne, îsal jî wêneyên xwe eşkere kirin.**

Cupoty Challenge (Close-up Photographer of the Year) ku her sal wêneyên herî baş ên ji nêz ve hatine girtin dineqîne, îsal jî wêneyên xwe eşkere kirin. Di nav wêneyên neqandî de gelek wêneyên cuda yên ji nêz ve hatine girtin, hene. Lê wêneyê wênegirê Holandî, Alex Pansier yê bi navê "True Love" yanî "Hezkirina birra" xelata wêneyê herî baş wergirt.

Di wêneyê Alex Pansier de du sivoriyên xweşik yên Ewropayê, tovê heşîşê bi hev re par ve dikin û diyar e di navbera wan de hevaltiyeke baş çêbûye. Hezkirina wan ya jidil dihêle ku ew bi hevre zikê xwe têr bikin û ji hev hez bikin. Alex Pansier ev kêliya xweşik qefaltiye. Ew dibêje, "Ji bo min gera li xwezayê kifşkirina tiştên nû ye. Bi rêya wêneyan ez çavdêriyan dikim û wêneyên xwe bi xelkê re parve dikim. Ez bêhtir kompozîsyonên besît û sade tercîh dikim."

Tracy Calder ku ew jî yek ji avakarê pêşbirka CUPOTY e, dibêje, "Kesên beşdarî vê pêşbirkê bûn û wêneyên ji nêz ve girtine, dikin ku em dinyayê bi çavekî dîtir bibînin. Nexasim di nav jiyanê de gelek tişt hene ku li ber çavên me ne, lê em nabînin. Ev wênegir dikin ku em xweşikiya ji ber çavên me direvin ji nû ve bibînin û wan kêliyan kifş bikin."

***Ozgûr Polîtîka***



## Girtîgeha kevin dibe navenda çandê

**Îtalya girtîgeha dîrokî ya li girava Santa Stefano ya ku bi salan e nayê bikaranîn, vediguherîne navenda çand û huner.**

Îtalya girtîgeha dîrokî ya li girava Santa Stefano ya ku bi salan e nayê bikaranîn, vediguherîne navenda çand û huner. Ji bo ev proje biçe serî, 70 milyon Euro hatine veqetandin.

Hikûmeta Îtalyayê girtîgeha li girava Santo Stefano ya ku bi şêweyê panaptikon (çavdêriya her tiştî) hatiye çêkirin, vediguherîne navenda çand û huner.

Ev hepsa ku ji sedsala 18'an maye, dê bibe muzexaneyeke servekirî. Dema proje bi dawî bibe,li navendê wê semînerên çandî û polîtîk werin dayîn û bi vî awayî dê rojên reş ên hepsê werin jibîrkirin.

Girtîgeha ku dişibe kolozyûmê, di sala 1789'an de ji hêla Melik Ferdînand ve hate avakirin. Di girtîgehê de gelek hucre hene û deriyê hucreyan hemûyan vedibin ber bi hewşekê ve. Ev girtîgeh, heta salên 1965'an jî li kar bûye û mirov lê mane.



***Ozgûr Polîtîka***

## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Arinc | Êş, jan, êşa digere: Arinca piyê min avêtiye ranê min. |
| Astengdar | Kesê ku hin astengiyên wî yên bedenê hene. Nîvişkan, seqet, kor, kerr, lal û hwd. |
| Delîve | Derfet, rê, imkan, firset, mecal... |
| Dirav | Kaxiz, yan jî hesinê çapkirî yên tişt bi wan tên kirîn. Pere. |
| Harmonî (Fransî) | Aheng, lihevhatin, lihevkirin, guncawbûn, xweşlihevkirin: Harmoniya stiranê xweş hatiye ristin. |
| Keval | Tablo, lewhe, tablet, nîgar, wêne, resim, şekil: Li ser kevalên dîrokî xetên balkêş û bedew hebûn. |
| Kolektîf (Fransî) | Karê bi hevkarî û alîkariyê tê kirin. Hevbeşî, pêgarî, zibare... |
| Rêgeh | Ciyê rê tê re derbas dibe. Istiqameta rê. |
| Sotin/sohtin | Şewitîn: Dilê min sot. Me êzingên xwe sotandin. |
| Sotemenî | Tiştên tên şewitandin; weke ardû, êzing, berhemên petrolê û hwd. |

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | ■ | A | ■ | O | X | ■ | K | Ê |
| 2 | S | I | B | Ê | ■ | E | N | A | M |
| 3 | A | R | ■ | D | O | Z | Î | N | ■ |
| 4 | ■ | A | R | Î | ■ | A | V | ■ | V |
| 5 | S | ■ | E | ■ | Ê | L | ■ | B | Î |
| 6 | P | A | Ş | Î | V | ■ | Z | Î | N |
| 7 | Î | Z | ■ | D | A | P | Î | R | ■ |
| 8 | ■ | E | M | ■ | R | ■ | R | A | Z |
| 9 | A | B | Î | S | ■ | E | Ç | ■ | O |

### Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 2 | | ■ | | | | | | | |
| 3 | ■ | | ■ | | | | ■ | | ■ |
| 4 | | | | | ■ | | | | |
| 5 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 6 | | ■ | | ■ | | ■ | | | ■ |
| 7 | | | | | | | ■ | | |
| 8 | ■ | | | | ■ | | | ■ | |
| 9 | | | | ■ | | | | | |

**ÇEP-RAST**

1. Wekhev... Pirsek di rewşa tewandî de
2. Mîrîtiyeke Kurdan ku di sedsala 13'an de li Rewandizê hatiye avakirin
3. Heyf
4. Roja piştî îro... Tîpa pêşî ya alfabeya Yewnan e
5. Plakaya navneteweyî ya Îranê... Rojek
6. Kurtebêja Antîmonê
7. Bajarekî me... Cejn, eyd
8. Sedemkarê tevgerê, paldêr... Baneşana bêhntengiyê
9. Teref... Elementên ne metal, mîna klor, fosfor û oksîjenê

**JOR-JÊR**

1. Kurteya piştî zayînê... Bajarekî me
2. Tiştê ku tama wî tehlokî, tirşokî û qemitokî... Bêzar û bêziman
3. Rastêşek... Tiştên ku tekildarî reşayiyê ne
4. Tevayiya hêzên leşkerî yên dewletekê... Hejmarên du, çar, şeş, heşt û hwd.
5. Notayek... Cephe, bere
6. Ilmê ku li ser hebûna Xwedê û rastiya dînê islamê disekine... Cihê lêdanîna koçeran
7. Eşîr, qebîle, hoz... Cihê ku çûk û teyr lê datînin... Kurteya elementa hesin
8. Kurteya ajansa nûçeyan a Firatê... Jin an jî mêrê ku hevsera/ê wî/wê miriye
9. Rojek... Tîpên navî yên "saet"ê... Niyaza xêr û qenciyê

## 'Abdullah Ocalan hêviya gelan e'

Kurdistanî û dostên wan li London, Strasboûrg, Oslo û gelek deverên din, weke her sal ji berpirsyarên komploya navneteweyî hesab pirsîn û gotin Abdullah Ocalan hêviya gelan e. ***R-3***





# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 942 | 16-Sibat- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## 'Emê ti carî hînê jiyana bê Rêberê xwe nebin!'

YJA Star: Li hemberî komploya navneteweyî ku dixwaze me hînî jiyana bêyî Rêbertî bike, em ê li ser şopa fermandarên xwe yên azadiyê bimeşin û bibin pêşengên xwegihandina Rêbertî. Em hînî jiyana bêyî Rêber Apo nebûn, em ê ti carî hîn nebin. ***R-2***




# `AZADIYA MIN GIRÊDAYÎ AZADIYA GELÊ KURD E`

Roja 15'ê Sibatê ne roja şînê ye; roja derxistina dersê û xwegihandina zanebûna erkê xwe ye. Herwiha roja eşkerekirina komployê ye. Komploya ku dixwazin di şexsê min de pêş bixin, gelek kûr e. Pêvajo hê ne zelal e. Lêbelê em bi aqil û bi zanebûn tev geriyan. Ez li vir her roj di nava berxwedanê de me. Bi sebir û têgihiştineke xurt berxwedaneke mezin dikim. Jîrî û zanebûn serkeftinê jî bi xwe re tînin.



### `Ji bilî têkoşînê ti rê li pêşiya me nînin`




Elya Oxlo teqez kir ku êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê berdewamiya Komloya Navneteweyi ya 15 Sibatê ne û got, bi armanca qirkirina gelên herêmê û têkbirina projeya biratiya gelan, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe li ser herêmên domîne. ***R-5***

### Mahmoud Patel: Divê bi Rêber Ocalan re hevdîtinên aştiyê dest pê bikin




Prof. Mahmoud Patel got, divê hêzên komploger wek nîşana niyeta baş daxwaziya azadkirina rêber Abdullah Ocalan bikin. Herwiha got, erdê Afrîkayê ji bo ku Komploya Navneteweyî rewa bikin, hat bikaranîn. ***R-5***

### Jinên Amedî ji ber bihayê zêde bertek nîşan dan



Li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê ji ber fatûreyên zêde yên kehrebe, av û gaza xwezayî û bihayê zêde yê pêdiviyên herî bingehî, di nava gel de bû sedema bertekên mezin. ***R-6***

### Çeteyekî DAIŞ'ê berî ku mayînê biteqîne ji aliyê QSD'ê ve hat girtin



QSD`ê ragihand ku fînansorekî çeteyên DAIŞ`ê berî ku li pêşiya dikanekê mayînê biteqîne ji aliyê hêzên wan ve hat girtin. Herwiha da zanîn ku ew çete li xwe mikur hatiye ku dewleta Tirkan alikariyê dide wan. ***R-3***

### Şanoger Kara: Me xwest îdeolojiya xwe bi şanoyê belav bikin




Şanogerê penaber Abdurehman Kara got, me ji tinebûnê dest pê kir. Armaca me ya ewil moraldayîna gel bû, lê piştî re me xwest îdeolojiya xwe bi şanoyê bigihînin gel. ***R-7***

### Bi roj zarokan fêrî zimanê dayîkê dike, bi şev jî cilê jiyanê dihone




Mamosta Nûrhan Yûsiv, ji dehsaliya xwe ve ji dayîk û xwîşkên xwe, fêrî karê destan yê benikên hirî bûye. Bi roj zarokan fêrî zimanê dayîkê dike, bi şev jî bi sîxikan ji benikên hirî, têştên pir xweşik û cuda çêdike. ***R-6***


**Li kû derê alozî hebe AKP li wir e**
Ahmet Aktaş **R-4**




**Krîza Ukrayna bandora xwe pir dike**
Zekî Bedran **R-5**

**Di mihraba şehîdan de.**
M.Emîn Sadûn **R-6**



**Hecî Ehmedê Şilyanî**
Sîpan Şînda **R-7**



# ‘Emê ti carî hînê jiyana bê Rêberê xwe nebin!’

YJA Star: Li hemberî komploya navneteweyî ku dixwaze me hînî jiyana bê Rêbertî bike, emê li ser şopa fermandarên xwe yên azadiyê bimeşin û bibin pêşengên xwegihandina Rêbertiyê. Em hînî jiyana bê Rêber Apo nebûn, emê ti carî hîn nebin.



Fermandariya Biryargeha Navendî ya YJA Starê derheqê salvegera Komploya Navneteweyî ya 15’ê Sibatê daxuyaniyek da.

Di daxuyaniyê de komploya navneteweyî bi soza tolhildana mezin hate şermezarkirin û şehîdên azadiyê bi rêzdarî û minetdarî hatin bîranîn.

Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku bi derketina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re xewn û xeyalên mêtingeriyê yên hêzên kokploger ên li ser Rojhilata Navîn derbeke mezin xwarin û wiha hate gotin: “Rêber Apo Kurdên azad afirand û bi vî rengî hişmendiyeke azadiyê da gelên Rojhilata Navîn. Komploya navneteweyî ya li hemberî Rêber Apo hate kirin, komployek li dijî Kurdîtiya azad, li dijî hişmendiya azadiyê ya civaka herêmî û cîhanî hate kirin. Komplo şerekî taybet e ku xwe dispêre talankirina îrade û hişmendiyê. Komplo konsepteke tunekirinê û înkarê ya bi rêk û pêk e. Di şexsê Rêber Apo de xwestin hebûna mirovahiyê înkar bikin. Înkar jî cezayê herî mezin e ku li hebûnê tê ferzkirin.

Rêberê me ku projeya sed salî ya hêzên hegemonîk a li Rojhilata Navîn pûç kir, di dîroka pêncî salên dawî de ji bo gelên bindest ên li Rojhilata Navîn paradîgmaya neteweya demokratîk ava kir û li ser piyan ma. Rêberê me bi vê sekna xwe ji bo gelan çavkaniyeke mezin a hêvî, bawerî û îradeyê ye. Em îro dibînin ku gotineke bi tenê ya Rêber Apo ku rêbertiyê ji Modernîteya Demokratîk re dike, tevahiya rojeva cîhanê diguherîne.”

**‘Rêya rizgarkirina rûmeta mirovahiyê kombûna li dora Rêber Apo ye’**



Fermandariya YJA Starê ragihand ku mirovahî êdî baş dizane ku hewldanên mezin tê dayin ku dengê rastiyê û azadiyê di nava dîwarên Îmraliyê de bê hefskirin û wiha domand: “Sîstema êşkenceyê ya Îmraliyê ku veguheriye şerma mirovahiyê, dike ku mirovên xwedî rûmet ên dixwazin ji vê şermê rizgar bibin li dora Rêbertî bicivin. Di serî de jin, mirovahî êdî naxwaze bi vê şermê bijî. Felsefeya jiyanê ya Apoyî ku her roj bêhtir cîhanî dibe, mizgîniya têkçûna dîrokî ya komplogeran dide. Hêzên komploger her çend çav û guhên xwe bigirin jî wê nikaribin ji dengê rastiyê yê civakan birevin. Li hemberî gavên bêesilhiştinê yên komployê, yekane rêya rizgariya rûmetê ew e ku hûn bêhtir li dora Rêbertî kom bibin. Ji ber vê yekê jin, ciwan, ji heft heta heftê salî her kesên ku baweriya xwe bi rastiya Rêbertî heye, ji bo rawestandina sîstema êşkenceyê ya Îmraliyê ku li dijî mirovahiyê ye, divê niha dengê xwe bêhtir geş bikin. Her çalakî, her gava ku ji bo hilweşandina dîwarên li dora Rêbertî tên avêtin, wê weke çalakiya herî bi esîl a dîroka azadiyê ya bi rûmet a mirovahiyê bê pênasekirin.”

**‘Gelê me û ciwan divê Şerê Gel ê Şoreşgerî bi pêş ve bibin’**

Di daxuyaniyê bal kişand ser girîngiya Şerê Gelê Şoregerî û ev bang hate kirin: “Em bang li gelê xwe bi taybetî jî ciwanan dikin ku Parêznameyên Rêbertî bixwînin û bi vê têgihiştinê şerê gel ê şoreşgerî bi pêş ve bibin. Biryardariya bingehîn a li ser şerê gel ê şoreşgerî jî îdîaya pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêbertî ye. Ev ibryardarî bi taybetî ji bo me jinan hinceta me ya şer û jiyanê ye. Şoreşa ku li Rojava bi pêşengiya jinan hate kirin, herikîna jinên Şengalî ref bi ref li nava xweparastin û têkoşînê, serhildanên jinan ên ji bo pêkanîna jiyana azad, ji encamên pêngava azadiyê ya Rêbertî ye. Wê bibe asta herî bilind a vê gava azadiyê ku civak, bi taybetî jin û ciwan li hemberî pirsgirêkên azadiyê xwe bi rêxistin bikin û şerê gel ê têgihiştî yê li dijî sîstemê bidin destpoêkirin. Lewma artêşbûna jinê ya YJA Starê ji bo jinên cîhanê mînaka şênber a bilindbûna azadiyê ye.”

**‘Emê tola herî mezin ji komlogeran hilînin’**

Herwiha di daxuyaniyê de bi navê jinên YJA Starî bang li jinan hemûyan hate kirin ku hêza xwe tevlî hêza YJA Starî bikin û xwedî li azadiyê û Rêberê azadiyê derkevin.

Daxuyanî wiha bi dawî bû: “Em parêzvanên jiyana azad a bi Rêbertî re; jinên YJA Starî mîna Şîlan Goyî, Nûjîn Êrsî, Sozdar Qamişlo, Nûda Sason, Delal, Gulnaz, Şevîn û Nalînan şopdarên fermandarên xwe yên azadiyê ne. Li hemberî komploya navneteweyî ku dixwaze me hînî jiyana bêyî Rêbertî bike, em ê li ser şopa fermandarên xwe yên azadiyê bimeşin û bibin pêşengên xwegihandina Rêbertî. Em hînî jiyana bêyî Rêber Apo nebûn, em ê ti carî hîn nebin. Her gerîlayeke jin a YJA Starê fedayiyeyeke azadiyê ya Rêber Apo ye. Rêber Apo ji bo me fermandarê şer û jiyanê ye, li ser bingeha fermanên wî yên azadiyê em ê jiyana mezin a azadiyê ava bikin. Bi şervaniya jiyanê ku her kêliya xwe bi Rêbertî re ye em ê tola herî mezin ji dijmin hilînin.”

Fermandariyê herî dawî destnîşan kir ku heta misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û afirandina jiyana bi rûmet a gelê Kurd wê têkoşîna xwe mezin bikin û biryardariya wan ji her demê bêhtir mezin be.”

# Fermandareke YPJ`ê: 15’ê Sibatê hewldana tinekirina vîna civakê bû



**Ji fermandarên YPJ’ê Bêrîtan Qamişlo diyar kir komploya 15 Sibatê komploya li ser tinekirina vîna civakê bû û got, tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan li ser tevahî mirovahiyê ye û divê bê zanin ku bi saya keda Rêber Ocalan jin bûn xwedî îrade.**

Ji fermandarên YPJ’ê ya herêma Cizîrê Bêrîtan Qamişlo 23’emîn salvegera komploya navneteweyî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan şermezar kir û wiha got: “Di roja 15`ê Sibatê de dewletên navneteweyî xwestin vîn û îradeya gelê Kurd tune bikin, ji ber vê yekê li ser Rêber Apo Komployeke qirêj pêk anîn.”

Bêrîtan Qamişlo derbarê bandora ramanên rêber Ocalan li ser civakan de wiha wiha got: “Fikir û ramanên Rêber Apo bû vejîna gelê Kurd. Derketina Rêber Apo di sedsala 20’an de, tişta ku dijmin di gelê Kurd de kuştibû ji nû ve zîndî kir. Rêber Apo esaleta tekoşîn û îradeya civaka Kurd derxist holê. Heger em dixwazin mirovahiyê azad bikin pêwîste em ji gelê Kurd de dest pê bikin. Ji bo mirov azad bibe ji bo desthilatdarî tune bibe di serî de pêwîste civaka Kurd ji vî tiştî xilas bibe. Mixabin bi hezarê salan e gelê Kurd rastî qirkirinê tê heya roja me ya îro jî dixwazin me qir bikin. Lê bele Rêber APO Kurd ji qirkirina çandî û fîzîkî xilas kir. Rêber Apo di şexsê gelê Kurd de mirovahî da pêş.”

**`Êrîşa li ser Rêber Ocalan êrîşa li ser mirovahiyê ye`**

Bêrîtana Qamişlo wiha domand:” Dema ku mirov li rastiya komployê û ev êrîşên ku li ser Serokatî dinêre, mirov dibîne ku ev êrîş li ser tevahî mirovahiyê tê kirin. Xwestin Rêbertî bikin nava çar dîwaran ji bo ku kirinên sîstema xwe pêk bînin. Ji ber ku di nava vê civakê de kesayetekî wekî Serokatî derketiye û sîstema modernîteya Kapîtalîst û sîstema desthilatdariyê qebûl nake. Serokatî got ‘hûn nikarin vê qirêjiya xwe li ser gelê me bidin meşandin’ bi vê êrîşa li ser Serokatî ev dewletên desthilatdar xwestin bi fîzîkî dilgirtina Serok Apo re xeyalên mirovahiyê bin pê bikin û bifetisînin. Ango dixwazin bêjin ku divê mirov li hember wan dernekevin û di tarîtiyê de bijîn. Piştî ku Rêbertî hat girtin bi awayekî pir berfireh li ser Rojhilata Navîn plan hatin amadekirin.

**`YPJ’ê bi saya keda Rêber Ocalan xwe ava kir`**

Bêrîtan Qamişlo bal kişand ser rola fikrê rêber Ocalan di avakirina YPJ`ê de û wiha berdewam kir:” Rêber Ocalan ji bo gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hêza jin gelek derfetên tekoşînê dan. Jinan bi tekoşîna Rêber Ocalan hebûna xwe nas kir. Li hemberî ferasata civakê ya ku jin di hinek karan de sînorda dikir, jinan di nava şoreşê de mîsyona pêşengtiyê girte ser milên xwe. Heger em dixwazin civakeke nû ava bikin, pêwîste her ferdek di nava vê civakê de xwedî tekoşîn be. Ji ber ku di Rojavayê Kurdistanê de gelek malbatan Rêbertî dîtibûn û bi salan li cem wî mabûn, gelek malbata zarokên xwe diyarî vê şoreşê kirin. Ji bo ku ev şoreş bi ser bikeve gelek jinan fedekariyên pir mezin kirin. Ev hişmendî jî weke jin, me ji Rêber Apo girtiye û weke hêza YPJ’ê di vir de pir fedayitiyên mezin kiriye. Şervanan bi şehadetên ku çêbûn, birîndariyên ku çêbûn bi cesareta xwe ya di nava şer de bi sekne werek tevlî şoreşê bûn. Bi saya keda bi salan ya Rêber Apo, YPJ îro xwedî li welat û civaka xwe derdikeve. Rastiya YPJ’ê ev e. Piştî ku YPJ’ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat avakirin, di nava civakê de guhertin û vegûhertinên mezin çêbûn.

**`Em bi xeyalên ku Serok di nava xwe de bibînin dijîn`**

Fermandara YPJ’ê Bêrîtan Qamişlo bal kişand tecrîda girankirî ya li ser rêber Ocalan û wiha got: “Ev 23 sal in ku Serokatî berxwedaniyê dike û rûbirû tecrîd û îşkenceya derûnî ya mezin tê. Dixwazin ku fikir û felsefeya Serokatî di hucreyekê de bifetisînin. Lê em dizanin ku çi dibe bila bibe, Serok fikrê xwe yê azad gihandiyê tevahî cîhanê. Em weke civak weke jin û weke kesayet em deyndarê Rêbertî ne û ew xeyalê me yê ku em bikaribin Serokatî bibînin û bi Serok re jiyan bikin, lê guhdar bikin heye. Serokatî kesayetê ku herî zedê heq dike ku di cîhaneke xweş de jiyan bike ye. Pêwîste di çarçoveya pêngava dem dema azadiya Rêber Apo ye, di her çar perçê Kurdistanê de û di tevahî cîhanê de her kes bibe xwedî helwest. Ne bes gelê me yê Kurd û gelê me yê Ereb di hemû cîhanê de divê civak û kesayatên azadîxwaz û demokrasîxwaz tevlî vê pêngavê bibin. Azadiya Rêber Apo rizgarkirina mirovahiyê ye, wê demê wê pergal jî mecburî bibe pirsgirêkên civakê çareser bike. Heya ku Serokatî di zindanê de be wê zext û zordarî li ser me hebe. Erk û misyona ku dikeve ser milê me gelekî giran e, bi derketinekê û bi meşekê ev tenê têrê nake. pêwîste em asta xwe ya tekoşînê xurt bikin û bikaribin zêdetir xebat bikin. Çi ji aliyê fikrî de, çi ji aliyê jiyanî û leşkerî de misyona ku dikeve ser milê me, xwedî derketina Rêber Apo ye.”

*ANHA*



# Şanoger Kara: Me xwest îdeolojiya xwe bi şanoyê belav bikin

Şanogerê penaber Abdurehman Kara got, me ji tinebûnê dest pê kir. Armaca me ya ewil moraldayîna gel bû, lê pişt re me xwest îdeolojiya xwe bi şanoyê bigihînin gel.

Di pêvajoya penberî, zor û zehmetiyê de gelek çîrokên lehengiyê ji ber xwe ve derdikevin ser dika dîrokê. Çîroka Şanoger Abdurehman Kara ji gundê Hilal ku salên 90’î ji ber zor û zilma dijmin penaber bûye, bi serê xwe mijara şano û dîsa fîlmek trajî-komîk e. Li nava Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) gelek çîrok û lehengên ku derketin ser dika dîrok hene. Yek ji van lehengan jî Şanoger Abdurehman Kara ku li nava penaberiyê dest bi karê şanoyê kiriye û ji tinebûnê kedek mezin a şanogeriyê li pey xwe hişt û heta îro li ser wê dewam dike heye.

Şanoger Abdurehman Kara ji gundê Hîlal ê navçeya Şirnex a Qilabanê ye. Di salên 90’î de gundê Hilal ji ber zilm û zordariya dewleta Tirk a ferzkirina çetetî û xwefiroşiyê derketin û koçberî Başûrê Kurdistanê bûye.

**GAVA YEKÊ LI DIBISTANÊ ŞANOYEK LÎST**

Kara bal kişand ser çawaniya dest bi karê şanogeriyê kiriye û got: “Dema min li gund dibistan dixwend, li dibistanê komên şano, muzîk û govend hebûn. Mamoste got tu jî li nava koma şanoyê de cihê xwe bigire, bi wî rengî min cihê xwe girt û me lîstikek li ser ‘Tirkiye-Yewnan’ lîst. Rolê min jî yeke Yunan bû.

**‘ARMANCA ESASÎ HÊZ Û MORAL DANA GEL BÛ; ÊŞ Û SERKETIN NÎŞAN DIDA’**

Ji ber zorî û zilma dijmin em penaber bûn û me berê xwe da Başûrê Kurdistanê. Sala 1995’an Saziya Çand û Hunerê hate avakirin. Sala 1996’an li ser esasê ku divê nava çand û hunera Kurdî de cihê xwe bigirim û kar û xebat bikim. Wê demê armana esasî moral û hêzê bide gel bû. Gel li hev kom bike û hêzê ji hev bigirin. Ji ber ku xebatek hunerî pispor nebû, çi bû ji ber xwe û xulqîner bû. Me bûyer û pêşketin bi kurte şano û sikêçan çêdikir. Bi şanoyên xwe me serketina gerîla û gel û dîsa binketina dijmin radixist ber çava. Me di rojên pîroz û taybet ên partiyê de kurte sikêç û şano çê dikirin. Aliyek gel pê kêfxweş bibin û moralê jê bigire.”

**‘KARÊ ME HEMÛ XULIQKARÎ BÛ, BI MEGAFONAN DENGÊ XWE DIGIHAND GEL’**

Şanoger Kara diyar kir ku her kampa penaber bû dev ji karê xwe yê hunerê berneda û wiha pêde çû: “Her kamp û cihê em lê penaber bûn û bi cih bûn, hemû hevalên Çand û Hunerê ku weke Koma Penaber dihatin gotin, li hev kom dibûn. Ji bo em moralê gel bilind bigirin, êş û azarên xwe bînin ziman bi rêya şanoyê, me seneryo amade dikir. Li gorî senaryoyê erka hevalan dihatin girtin û wisa dilîstin. Mijara kostûm jî girîng bû, me ew yek bi cilûbergên kevin û dîsa cilên leşkerî yên qetiyayî bi kotek peyda kirî rola leşker dilîst. Me bi rengekî xuliqkar kostûmên xwe ji tiştên kevin ku qet mirov hêvî nake tiştek jê bibe amade dikir. Mijdara deng jî me bi megafonan ku di nava çalakî û mîtînga de tên bikaranîn, pêk dianî. Ji ber vê rewşa me ya ecemî, ji nava şano şano derdiket. Gel bi vê rewşê pir kêfxweş dibû û kelecanî dibû. Gel bi çaveke pir mezin li me dinêrî, weke ku şanogerên bi salan kar kirîn û pispor li me dinêrî. Pir rêz nîşanî me dida. Me jî ewqasî rêz dida wan. Bi vî rengî min dest bi şanoyê kir û hê jî didome.”

**‘ÎDEOLOJIYA XWE BI RENGÊ ŞANOYÊ NÎŞAN DA’**

Kara diyar kir ku her çûn xwe pêş xist û nava civakê de cihek taybet girt û asta şanoyên xwe û mijarê wê xurtir kir. Kara anî ziman ku şano êdî bi renge îdeolojî nîşan da û ev nirxandin kir: “Civakê destpêkê weke çalakî û pêkenînê li me nêrî, lê her ku çû me xwest şanoya xwe veguherînin rengekî îdeolojî. Heger ku veguherî îdeolojî. Me xwest îdeolojiya xwe bi rengê şanoyê ji bo gel bigihîne. Me bi şanoyên xwe raman û fîkra îdeolojî ya partiyê nîşanî gel bidin. Me rewş û pêşketinên Kurdan kirin mijarên şanoyên xwe û wisa ji ken zêdetir mijara îdeolojî nîşan da. Bi şanoyê me xwest hem îdeolojî û hem jî xebatên rêxistinê, heman demê êş û azarên Kurdan ên hezar salan di bin destiya dijimin de mayî, şaştiyên Kurdan, hem gel perwerde bikin, hem jî rastiya heyî nîşanî gel bikin.



**‘ÇAND NASNAME, NASNAME ZIMANÊ ME YE’**

Hedefa dijmin a herî girîng ew e, mirov ji çanda wî dûr bigire. Li rexê şoreşê me hewl da, qasî derfet têrê kir, çanda xwe bidin domandin. Ji ber ku em li ser wê çandê mezin bûne, ji bo wina nebin. Çand nasnameya me ye. Nasnama me zimanê me ye. Eger em çanda xwe winda bikin. Em ê zimanê xwe winda bikin, ji Kurdbûnê dûr bikevin.”

**BI TENA XWE ÊŞ, AZAR Û REWŞA CIVAKÊ VEDIBÊJE**

Di gelek çalakî û rojên taybet de Şanoger Abdurehman Kara bi tena xwe derdikeve ser dikê û dilîze. Li ser vê jî ev got: “Kerekterê min zêdetir li pêkenokê tê. Carnana ez tenê derdikevin ser tikê, mijarê wisa digirim dest ku kêmanî û şaştiyeke civakê, an jî serketineke wê be, ji cihekê ve êrîşek derûnî bê ser me civakê bê kirin, bi renge komedi bînim ziman. Hinek kêfa wan jî bi min tê. Têkiliyek baş a min û gel heye, li ser vê tewerê ji bo her şanoyek dilîzim fikir digrim û ji bo baştir vê nîşan bidim dikevim nava hewldanan. Divê civak xwe di şanoyê de bibîne. Bibe pareyek ji şanoyê. Dema nebû parçeyek ji wê şano nagihêje armanca xwe.”

**‘DIBISTANA ME YA HERÎ MEZIN CIVAKA ME YE’**

Kara anî ziman ku kar û xebata wan li ser xuliqkarî ye û wiha domand: “Kêrhatiyê me yên fîzîkî û fikrî ye. Dibistana me ya herî mezin civaka me ye. Xweşî û nexweşî, çalakî û rewşa civakê mijarên me yên şano yê derdixin, fikrê kar ji bo me derdixe. Civak mamostayê ne me ye.”

**‘EM NIKARIN BERHEMÊN XWE PÊŞKÊŞÎ CIVAKA XWE YA BAŞÛR BIKIN’**

Şanoger Kara bal kişand ser astengî û rêgiriya PDK’ê ya li ser Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem cûdî jî û got: “Rêgirî û dorpêça PDK’ê ya li ser wargehê çawa ji bo hemû saziyên din û gel astengiye, ji bo xebatên me jî astengiyek mezin e. Bûye astengiyek ku em nikarin huner û şanoyên xwe pêşkêşî birayên xwe yên Başûrê Kurdistanê bikin. Ne hemû di nava PDK’ê yên asta jor de zexteke mezin li me dike.”


**‘EM YEK BIN WÊ HER KES RÊZ JI BO KURDAN BIGIRE’**

Hêviya min ew e ku PDK dev ji siyaseta alîgiriya dijminê Kurdan Tirkiye dûr bixe, vegere ser yekrêziya resen a Kurdayetiyê. Eger vê bike, wê her mirov, her milet û heta her dewletê rêz nîşanî Kurdan bike. Qedir û qîment bidin hev.”

**‘BI ISRAR KAR BIKIN Û VEGUHÊZIN NIFŞÊN NÛ’**

Herî dawî Şanogerê Penaber Abdurehman Kara daxwaz û bang li humermend û her kesê karê huerê dike kir ku bi israr karê hunerê bike û veguhêze nifşên nû û got: “Divê hunermendên Kurd bi israr û rêbazên herî baş çand, zimanê Kurdî veguhêzin nifşên nû. Çand û kevneşopiyê bi ciwanan bidin nîşandan. Hemû hunermed êş û azarên Kurdan bi israr û vekirî, bînin ziman. Nifşên dema nû, berê wan zêdetir li derve ne, ji bo nekevin xefik û davên dijmin û dîsa çanda xwe veguhêzin karek baş û bi israr bê kirin, wê encamek baş jê bê girtin.”

*ANF*



**Hecî Ehmedê Şilyanî**

Sîpan Şînda

Dengbêjî ne tenê dengekî xweş û az e. Dengbêjî miqam e, lihevanîn e, selîqet e. Dengbêjî karîna bi riya peyvan û miqaman dengê dilê xwe gihandina dilê guhdaran e. Dengbêjî hostahiya peyvê ye, ya pêlên dengî ye, ya nefesê ye, ya bêhnê ye, ya hahî yan e. Dengbêjî ew huner e ku dema dengbêj bixwaze bêhna xwe hilde, dengê dilê xwe bi riya pêlên dengê xwe digihîne guhdaran û ew ji bi hahiyên xwe hevalbendiya dengbêjî dikin û wî bi tenê nahêlin.

Belê emê îro behsa dengbêjekî ji we re bikin ku ev huner û cewher bi wî re hene. Ew dengbêjekî li dû miqamê stranê dikeve û hewl dide ku stranê li gorî reseniya wê, li gorî miqam û qaîdeyên wê yên ewilî bêje. Ji ber wê ew gelek caran li pey bûyerê dikeve, dewsa çîroka stranê dişopîne û dixwaze bizane ka dengbêjên kevin stran tam bi çi miqamî gotine û ew ji li gorî miqamên wan bêje. Hecî Ehmedê Şilyanî, di sala 1959 ê de li gundê Şilyan yê girêdayî Şirnexê tê dinê. Ew zarokê nexrî ye. Ji ber wê bavê wî, wî serbest berdide di jiyanê de. Dibistana seretayî diqedîne. Ew di 16 saliya xwe de dizewice û weke hemû zarokên welatê parçebûyî hêj di temenê xwe yê biçûk de dikeve di bin berpirsiyariyê de. Ew hêj di kiçikatiya xwe de guhdariya dengbêjan dike û dengbêjî bala wî dikişîne. Ew dibêje ez teqrîben 7-8 salî bûm diya min şev rabû li ser darê lendan û şîr da zaroka xwe ya di mehdikê de. Ewê bere strana Sofî Birahîm ji digot û ez ji hişyar bûm û min guhdariya wê dikir û min ew stran hingê girt. Dengbêjiya wî ji weke ya gelek dengêjan ji malbatê tê. Hem mal xala bavê wî û hem ji malxala wî denbêj bûne. Dibêje xalên min Gurî û Ûnisê Hacî Şilyanî dengbêjî dikirin. Dibêje stranên Mala Mêran (Bavê Lalo) û Lêlê Dînê ji aliyê Mihemê Emerê Cangîr ve di radyoya Êrîvanê de hatibûn gotin û min ew herdû stran ji radyoyê girtin. Dibêje rojekê em ji dibistanê derketin û em zarok bi hevre çûyîn gundê Bilmat seyra dawetê. Dema bû şev em çûyîn ber deriyê zavê û me ji xwe re di lehîst. Min dît zelamek derket ber derî û got ‘ka ew kurikê Mihê Îsivê Sofî’ û hevalên min gotin ‘aha eve’ û dibêje dema wî welê got ez tirsam û revîm. Lê belê zarokan ez girtim û teslîmî wî zelamî kirim. Zelamî ez birim cem zava û birazavan û hinek sêv û pirteqal dan min û ji min re got ka ji me re wan her du stranan bêje. Cara ewil e ew di civata de stranan dibêje û ji wê rojê û hetanî niha di dawetan de, savarhêranê de, dankutanan de, di şahiyan de stranan dibêje.

Rojekê diçe Şirnexê û di civatekê de Salihê Emerê Cangîr dibêje wî ka stranekê bêje. Lê belê ew di cemide û nikare bêje. Dibêje min beriya hingê mamê Salih nedîtibû û sehma wî gelekî li ser min hebû. Hecî Ehmed bi xwe ji stranan dinivîse û miqamên wan ji dibêje. Lê belê hêj strand xwe tomar nekirine û ne weşandine. Hecî Ehmed di herêma Şirnex de gelek ked daye ku heta dengbêjên herêma Botanê bigihîne hev û bi wan re bernameyan çêke. Gelek bernameyên li Mala Dengbêjan ya Cizîra Botan hatîn çêkirin bi saya serê wî pêk hatine. Heta niha ew li stranên dengbêjiyê berhev dike. Ew niha ji li Şirnex dijî û xwediyê çar zarokan e.

# Jinên Amedî ji ber bihayê zêde bertek nîşan dan

**Li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê ji ber fatûreyên zêde yên kehrebe, av û gaza xwezayî û bihayê zêde yê pêdiviyên herî bingehî, di nava gel de bû sedema bertekên mezin.**

**Darîn Silê/Qamişlo**



Di pêvajoya dawî de bi zêdebûna bihayan re qeyrana aborî di nava gel de bi awayekî zelaltir xwe nîşan da. Dema karsazên ku fatûreyên wan li gorî meha borî du-sê qat zêde bûne, dest ji kar berdan, bi hezaran kesên ku bertek nîşanî fatûreyên hatine dan, daketin kolanan. Me jî ji jinên ku diyar dikin pêvajoya tê jiyîn ber bi xelayê ve diçe, bi pirsa "Ma hûn dikarin debara xwe bikin?" pirsî. Dema ku me ev pirs ji jina ku nikare ji zarokê/a xwe re mama bikire bigire heya xwendekarên ku pereyê wan ji bo pirtûkên dersê namînin, pirs kir yekê ji wan jî negot "Em dikarin debara xwe bikin." Jinên ku dibêjin ji ber zêdebûna bihayan nikarin nan jî bîbin malên xwe, ji bo kêmkirina bihayên hatine û pêşî li bihabûna zêde bê girtin bang kirin. Jinên ku nikarin debara xwe bikin pirsgirêkên ku dijîn ji ajansa me re vegotin.

**"Ez nikarim pêdiviyên xwe yên bingehî pêk bînin"**

Berna Baran: Piştî pêvajoya dawî em bi tu awayî nikarin pêdiviyên xwe pêk bînin. Bursên tên dayîn bi tu awayî têr nakin. Dîsa çûnûhatin, pirtûk û xwarin pir biha ne. Me niha xwarin xwar û her çend em têr nebûn jî me serê kesî 50 lîre da. Jixwe ji aliyê civakî ve aktîvîteyên, sînema û ketina muzeyan jî diyar e. Em wekî xwendevan nikarin tiştekî bikin û em dixwazin ji vî welatî biçin. Em bi tu awayî der barê welat de tiştek baş nafikirin. Tu hevalên me nikarin debara xwe bikin. Xwarinên li yûrdan pir biha ne. Ez nikarim pêdiviyên xwe yên bingehîn bi cih bînim.

**"Em nikarin ped bistînin"**

Weke jinekê niha di rojevê de pirsgirêka peda hîjyenîk heye. Em nikarin ped bikirin, jixwe bihayê zêde tê zanîn. Tu ya herî erzan û herî bê kalîte dikirî. Ez tişta ku pêşaniya min a sereke ye nikarim bistînim. Mînak telefona min şikestiye lê ez nikarim telefonê bidim çêkirin. Dema em bi hevalan re rûdinin tenê mijara me aborî ye. Ji xeynî vê em nikarin qala tiştekî bikin. Ji bo pêşerojê tu hêviyên min nîn in. Ji bilî nezelaliyê tiştek tune ye. Fikra tu kesî ya pêşerojê tune ye. Tiştekî ku welat bide min tune ye.

**"Em nikarin deynê tiştên ku me ji dikanan kirîne bidin"**

Semra Tedik: Di pêvajoya dawî de ji ber zêdebûna bihayan em gelek zehmetiyan dikşînin. Niha hevjînê min naxebite û em çar zarokan didin xwendin. Debara jiyanê gelekî zehmet e. Ez nikarim tu tiştekî ku zarokên min dixwazin bigirim. Êdî xwarin pir hindik tê ser sifreya me. Hin roj hene ku em bi rastî nikarin yek tiştek bixwin. Em ji ber pirî deyn dikin êdî nikarin tiştekî bi deyn ji dikanan bikirin û em nikarin deynê xwe jî bidin. Ger wisa bidome dê komkujiyek mezin pêk were. Xwedê alîkariya me hemûyan bike, pir zehmet e. Kesê têr ji rewşa birçî fêm nake. Mirov êdî ji ber hêrsê nizane çi bibêje. Divê ji bo bihabûn û giraniyan tiştek bê kirin.

**"Di malekê de deh kes jî bixebitin têrê nake"**

Bêrîtan Aras: Jiyan pir zehmet e. Em bi zehmetiyan fatûreyên xwe didin. Mirov êdî nikarin kirêya xaniyên xwe jî bidin. Mirov êdî nikarin li zarokên xwe jî binêrin. Em ji Şirnexê heta li vir ji bo bijîşk hatin, me tenê ji bo mûçeya muayeneyê 600 lîra da. Gel nizane çi bike. Di malekê de deh kes jî dixebitin têrê nake. Pîşeya tu kesî tune ye. Xwedê alîkariya me bike. Ez çi bibêjim? Her tişt biha ye. Kes nikarê êdî ne firingî, ne balîcan û ne jî bîberan bikire.

**"Li cîhekî rûniştin û vexwarina çay bûye luks"**

Hatîce Aras: Dema dahata me nebe û em nikaribin bixebitin, jin rastî gelek zehmetiyan tên. Mûçeya asgarî pir kêm e. Kes bi wê nikare debara xwe bike. Bihabûn gelek aloziyan ava dike. Ev meh fatûre du-sê qat zêdetir hatin. Ji bo xaniyek yekqatî ji hezar zêdetir fatûre dinivîsin. Ji her tişt re bihabûn hat. Êdî kes nikare li cihekî rûnê û çayek vexwe. Gelek zehmetiyan dijî. Jiyan pir zehmet derbas dibe.

**"Ez qet nizanim wê dawiya me çibe"**

Yuksel Aslan: Her tişt pir zehmet e. Zarok nikarin debara xwe bikin. Mirov sebrê dide malbatên xwedî zarok. Berê bi 100 lîre re her tişt dihat kirîn. Lê niha ev ji bo tiştekî têrî nake. Ez qet nizanim dê dawiya me çi bibe. Divê di zûtirîn demê de ev bihabûn bên biguhere û her tişt li gorî bihayê xwe ji nû ve were sererastkirin. Welatî ne mecbûr in berdêla qeyranê bidin. Mirovan vê êşê û vê rewşê heq nekirine.

**"Ez nikarim ji pitika xwe re mama bistînim"**

Ayşe Koçanarslan: Ez ne dikarim mama ne jî paça pitika xwe bikirim. Ji ber ku lêçûn pir zêde ye, em nikarin gelek pêdiviyên xwe bi cih bînin. Pir tiştan kêm dikin û didin. Nirxa mamayê zarokan 110 lîre ye, em an jî kesên din çawa biçin û bikirin? Divê demildest ev bihabûn bên daxistin. Ji ber ku ez nikarim bi tendurustî xwedî bibim zaroka min nebaş mezin dibe. Piraniya berhemên me yên xwarinê roj bi roj kêm dibin û em nikarin ên nû jî bikirin. Em nikarin pêdiviyên xwe pêk bînin. Ez qet nizanim dê dawiya ve karê li ku biqede.

***JINHA***

# Bi roj zarokan fêrî zimanê dayîkê dike, bi şev jî cilê jiyanê dihone

**Dilîn Ehmed-Ronahî**

**Mamosta Nûrhan Yûsiv, ji dehsaliya xwe ve ji dayîk û xwîşkên xwe, fêrî karê destan yê benikên hirî bûye. Bi roj zarokan fêrî zimanê dayîkê dike, bi şev jî bi sîxikan ji benikên hirî, têştên pir xweşik û cuda çêdike.**

Karê benikên hirî karekî zivistanî ye ku mirov, şevên xwe yên dirêj pê diborîne. Herwiha gelek mirov jî bi taybetî jin, ji heskirina karê bi benikên hirî, cil û tentenyên cuda çêdikin. Jina bi navê Nûrhan Yûsiv jî hem mamosteya zimanê kurdî ye, hem jî pispora çêkirina her cure cil û tiştên bi sîxan tên çêkirin e. Cilên jin, zarok, mêr û tiştên malê bi sîxik û benikên xwe yên hirî, çêdike.

Li ser heskirina xwe ya ji benikên hirî, mamote Nûrhan Yûsiv ji me re wiha axivî.

`Ev 40 sal in ez fêrî vî karî bûme, salek ser min re derbas nabûye ku min kar nekiriye.` Nûrhan diyar kir ku ji zaroktiya xwe ve ji dayîk û xwîşêkin xwe fêr bûye. Dema ditît ku dayîka wê ji benikên hirî cil û teneneyên pir xweşik çêdike, pir ji vî karî hes dike. Ji wê demê ve heskirina wê ya karê destan, dest pê dike.

Nûrhan dibêje, `tişta herî xweş ew e ku dema mirov tiştekî balkêş û xweşik ji keda xwe diafirînin e.` Herwiha Nûrhan diyar dike ku ev kar hem pêşesazî ye hem jî karê heskirin û mereqê ye. Lê di nirîna wê de, hemû kar bi taybetî karê destan ku karê heskirin û merewû be, mirov dikare xwe pêş bixe.


**`Mirov ji afirandina keda xwe kêfxweş dibe`**

Nûrhan dide xuyakirin ku, eger derfetên wê hebûna, wê projeyeke taybet ji xwe re danîbûya. Lewra ew di karê xwe de pispor e. Nûrhan got, `karê desta mbi giştê mirov ji xweşikbûna wê hes dike.









Bi taybetî karê benikên hirî.` Ji ber ku cilên hirî mirov ji sermaya zivistanê diparêze, her kes jê hes dike. Hem ji bo domandina çandê, hem jî ji bo faydeyê karê destan ji gel re. Mamosta Nûrhan ji zû ve li ser vekirina projeyeke teybet dihizire. Lê ji ber ku derfetûm wê nînin, nikariye vê gavê biavêje.

Nûrhan Yûsiv wiha got; `Eger hinek bi min re bibin alîkar, emê projeya karê destan çêkin. Ji ber ku piraniya mirovaan ji cil û tenteneyên hirî hes dikin.` Herwiha ne cil tenê, tentenêyên tawle, firax û televizyonaan û gelek tiştên din çêdike. Nûrhan diyar kir ku, karê destan pir bi sûd e hete mirov li ser xwe be, wê kar bike. Mamosta bi bîra xwe tîne dema xwîşêkên wê dibûne bûk, dayîka wê ji wan re tenteneyên cuda çêdikirin. Mîna balîv, neqşên nivîna û gelek tiştên pir xweşik û cuda, çêdikirin.

Nûrhan diyar kir ku wê jî ji xwe re mîna dayîka xwe rehela xwe bi tenteneyan xemilandiye. Nûrhan dibêje, heta çend salan min ji xwe, zarokê xwîşkê xwe re cil çêdikirin. Lê niha ji ber ku çar nevî û sê bûkên min hene, ez piranî cil û tiştên ku ew dixwazin çêdikim.`

**`Bêhna min bi karê min firey dibe`**

Ji qerbalix û bûyerên nexweş yên cîhanê, Nûrhan bêhna xwe bi karê destan vedide û dibêje; her mirov bêhna xwe bi awayekî fireh dike, hin bi guhdarîkirina mûzîkê, hin bi derketinê, hin jê bi girî, gelek rêbazên cuda yên bêhnvedanê hene.' Mamosta Nûrhan jî bi sîxik û benikên hirî bêhna xwe derdixe. Lewra ew ji piçûkayî ve vî karê dike, bûya beşek pir girîng di jiyana wê de.

Mamosta Nûrhan got, karê bedikên hirî li ser mekîneyan jî tê çêkirin, lê ji ber ku çêkirina ser destan çêtir e, piraniyê dayîkan li gel me çêdikin. Jixwe cil yan jî tentene hene, li ser du sîxan û hene ser sîxekî. Ev jî li ser tişta ku mirov çêdike dimîne. Zehmetiyên wê hene ez nabêjim na, lê ji ber ku ev kar ji heskirinê ye, mirov jê aciz nabe.

Nûrahan Yûsiv di dawiya axaftina xwe de bang xwedîmereq kir ku, ji karê ku ew jê hez dikin bi israr bin. Lewra kar bi heskirinê pêş dike.



Di mihraba şehîdan de.

**M.Emîn Sadûn.**

Di dirêjayiya dîrokê de, gelê Kurd êrîşî welatê ti gel û neteweyan nekiriye û ti carî şer jî nexwestiye. Di vê mijarê de, mirov dikare bêdudilî bêje; gelê Kurd ne miletekî êrîşkar û şerxwaz e. Lê ev şerê giran û wêranker bê vîn û xwesteka wî hatiye derê mala wî û bi ser de hatiye sepandin.

Dagîrkerên welatê Kurdan, dema welatê wan dagîr kirin, du bijarde yan jê du rê tenê li pêşiya vî gelê aştîxwaz hiştin. Rêya yekê, ku ev gelê resen yê li ser xaka xwe ya dîrokî dijî, destê xwe di ber xwe de berde, bindestî û koletiyê li ser xwe qebûl bike û ti carî doza mafê xwe yê rewa di jiyaneke serbest û azad de neke. Rêya duduyan, hildana ala parastin û berxwedanê ye. Wekî miletekî xwedanê xakê mafê wî ye ku doza jiyaneke hevbeş bike û di maf û erkan de wekhev be û cudayî di nav bera wî û gelên pê re dijîn nebe. Herwiha jiyana xwe bi aramî û serbestî bi rê ve bibe. Lê weke tê xuyakirin dagîrkerên Kurdistanê ne welatê wî tenê dagîr kirine, ji mafê wî yê mirovî jî bê par hiştin û her rengê siyaseta regezperestî û şovînîstî derheqa wî de bi kar anînin. Xwestin wî tine bikin, yan jî bihelînin.

Li hemberî vê siyasetê gelê Kurd xwe bi rêxistin kir û agirê şoreşê pê xist. Herwiha felsefeya biratiya gelan, jiyana azad, wekhev pejirandin. Lê li hemberî vê berdêlên giran jî dan. Erê berdêlên vê rê giran in lê gel gihatiye wê baweriyê ku tevî ev rê zehmet û dijwar e, lê rêya rizgariyê ji nîrê zordarî û dagîrkeriyê ye. Piştî xebateke xur û dana bi hezaran şehîdan vê xebatê berhem girt. Van destkeftiyan di serî de dewleta tirkî dagîrkerên Kurdistanê xistin nava tevgerê. Erdoxanê xwînrêj bergehê êriş û gefên xwe li dijî şervanên azadiyê û parêzvanên rûmetê firehtir, xurtir û zêdetir kirin. Jixwe ji roja Rêveberiya Xweser hatî damezrandin heta îro vî xwînmijî li dijî van destkeftiyan şer ranewestandiye.

Li aliyê din êrişên dagîrkerên Kurdistanê bi rêbaza şer, reşkirin, dorpêçkirin û birçîkirinê, bi rêya komên çete û terorîst, nîşana wê ye ku siyaseta vîna gelan, biratiya wan serkeftî ye. Ev serkeftin bixwe dibe cihê nerazîbûnê li cem rêjimên dîktaror û faşîst. Weke din çiqas nakokî û hevrikiyên dagîrkerên Kurdistanê kûr û dijwar bin jî, dema mijar dibe mijara Kurdan tev dibin yek û rêkeftinên stratejîk jî bi he vre mor dikin. Azadîxwaz li kîjan parçeyî serê xwe hildin û doza wekhevî û rûmetê bikin, wê dagîrker qebûl nekin û li dijî wan dawaziyên rewa rawestin û bi her rêbazê li dijî wan şer bikin. Jib o wê divê gelê Kurd û gelên pê re dijîn, bigihin wê baweriyê ku rizgariya gelan û parastina destkeftiyan di bawerî û hevgirtina wan de ye.



# 'Abdullah Ocalan hêviya gelan e'

**Kurdistanî û dostên wan li London, Strasboûrg, Oslo û gelek deverên din, weke her sal ji berpirsyarên komploya navneteweyî hesab pirsîn û gotin, Abdullah Ocalan hêviya gelan e.**

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**






Li Londonê li ser banga Meclisa Gelê Kurd ya Ingilîstanê, bi pêmana salvegera 23an ya Komploya Navnetewî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li ber avahiya BBC meşeke girseyî hat lidarxistin. Kurdish Solidarity, Freedom For Ocalan Campaing, sendîqayên Ingilîstanê, rêxistinên girseyî yên demokratîk û bi sedan kes beşdarî meşê bûn. Di meşê de balonên bi daxwaziya azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, alên YPG, YPJ, TCŞ/TekoJin, MLKP û wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatin firandin. Di meşê de dirûşmên "Bijî Serok Apo", "Freedom Ocalan" (Ji Ocalan re azadî), "De list PKK Free Ocalan" û "Terorîst Erdogan" hatin avêtin.

Rêxistinên ciwanên Kurd û ciwanên enternasyonalîst jî li Frankfûrtê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan "Meşa Dirêj" dabû destpêkirin, çalakger 13 mehê tevlî çalakiya li Strasboûrgê bûn. Ji Swîsre, Elmanya û Fransayê bi hezaran kes li ber stasyona trenê ya Strasboûrgê kom bûn. Her çiqasî polîsên Fransî nehiştin ku piraniya xelkê biçin Elmanyayê, li gel hemû astengiyan jî bi hezaran kes tevlî çalakiyê bû. Çalakî di saeta 12.00'an de li ber îstasyona trenê ya Strasboûrgê dest pê kir û li qada Long Dîstance bi dawî bû. Ciwanan di çalakiyê de timî dirûşmeyên bi zimanê Kurdî, Fransî û Tirkî komplo şermezar kirin.

Herwiha di heman rojê de li Osloyê jî meşeke girseyî hat lidarxistin. Meş ji aliyê NCDK'ê ve hate organîzekirin. Kurdistanî û dostên wan li ber stasyona trenê ya navendî li hev civiyan, heta ber avahiya Parlamentoyê meşiyan û piştre mîtîngek li dar xistin. Nûnerên Solidaritet med Kurdistan jî piştgirî dan meşê. Di meşê de jinan cihê xwe li pêş girt û pankartên ku ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re azadî dixwaze hate hilgirtin. Di meşê de dirûşmên "Bijî Serok Apo", "Frihet for Ocalan" (Ji Ocalan re azadî), "Fredi Kurdistan (Ji Kurdistanê re azadî)", "Terorîst Erdogan " "NATO û Tirkiye bila ji Kurdistanê derkevin" hatin avêtin.



Çalekiyên ku li pir walatan bi pêmana salvegera Komploya Navnetewî ya 15 Sipatê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatin li darxistin, bi giştî peyama wan ew bû ku Abdullah Ocalan hêviya gelan e û divê demildest bê berdan.

# Çeteyekî DAIŞ'ê berî ku mayînê biteqîne ji aliyê QSD'ê ve hat girtin

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**QSD`ê ragihand ku fînansorekî çeteyên DAIŞ`ê berî ku li pêşiya dikanekê mayînê biteqîne ji aliyê hêzên wan ve hat girtin. Herwiha da zanîn ku ew çete li xwe mikur hatiye ku dewleta Tirkan alikariyê dide wan.**

Navenda Ragihandinê ya QSD`ê di vê derbarê de daxuyaniyek weşand.

Daxuyanî wiha ye:

"Yekîneyên taybet ên Hêzên Sûriya Demokratîk, terorîst û berpirsê belavkirina alîkariyan û fînanskirina şaneyên terorîst ên rêxistina terorîst a DAIŞ`ê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê girt. Ev kes heman demê pere digihandin malbatên endamên rêxistina terorîst ên li kampa Holê. Terorîstê bi navê Mihemed Ehmed Kerez li xwe mikur hat ku alîkariya ji hin aliyên li Tirkiyê û herêma



Idlib a bakur rojavayê Sûriyê di wergirt û paşê li şaneyên terorîst ên rêxistina DAIŞ`ê, belav dikir. Terorîst ji bajarê Babê ye. Rewşên mirovî keysbaz kir da ku li bajarê Reqayê bi cih bibe. Terorîst xwe mukur hat ku şaneyek ava kir da ku bazirganên bajarê Reqayê şantaj bike û di bin gefan de wan neçar bike ku pereyan bi navê (Zikir) bidin wan û paşê wan pereyan li şaneyên DAIŞ`ê belav bikin.

Herî dawî terorîst hewl da ku mayînekê li pêşiya dikanekê biteqîne û beriya ku mayînê biteqîne, di çalakiya Hêzên Taybet ên QSD'ê de hate girtin.

Li gorî mukurhatinên Kerez ê terorîst, destpêkê erka wî wergirtina alîkariyên ku ji dewleta Tirk û Idlibê ve dihat şandin da ku li şaneyan li herêmên cûda ji wan kampa Holê, belav bike bû.

Terorîst Mihemed çavkaniyeke din ku girêdayî şaneyên fînanskirinê eşkere kir. Mîsyona vê çavkaniyê şantajkirina bazirganan e, her wiha zextê ku li wan dikin da ku pereyan bidin. Terorîst têkiliya xwe bi kesê bi navê Îbrahîm re eşkere kir ku erka wî wergirtina mayînan ji heman herêmên ku pere ji wan tê (Tirkiyê û Idlib) da ku bazirganên herêmî yên ku pereyan nadin şaneyên rêxistinê bikin hedef û şantaj bikin. Ev terorîst sûd ji nasîna terorîst (Kerez) bi bazirganên herêmî re werdigirt, ji ber ew li sûkên mezin ên bajarê Reqayê dixebitî."

# Ji bo Şehîd Xebat Marînos konê sersaxiyê hat vedan

Li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) ji bo şervanê QSD'ê Xebat Marînos ku di 8'ê Sibatê de li Hesekê şehîd bibû, konê sersaxiyê hat vedan. Di merasîma bîranînê de bavê şehîd got, ew bi şehadeta kurê xwe serbilindin û heta dawiyê ew ê li pey doza şehîdên xwe bin.

Li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) ji bo şervanê QSD'ê Xebat Marînos konê sersaxiyê hat danîn. Şêniyên wargehê û her sê meclîsên wargehê serdana konê sersaxiyê kirin. Merasîma sersaxiyê bi deqeyek rêzgirtin ji bo tevahî şehîdên Tevgera Azadiya Kurdistanê destpê kir. Piştî rêzgirtinê li ser navê gelê wargehê Rubar Îlhan axivî. Îlhan di destpêka axaftina xwe de



sersaxî ji Rêber Apo, Malbata şehîd û gelê Kurd yê welatparêz re xwest û wiha got: "Kesayetên mîna Şehîd Xebat di têkoşîna me de cihek pir girîng digrin. Em wan bi minetarî bibîrtînin û soza şopandina rêya wan didin. Wek Rêber Apo jî dibêje 'Ez wargehê bikim sembola Kurdistanê.' Ji ber vê yekê em bûne hêviya gelên bindest, emê berdewam jî bikin." Piştre li ser navê malbatê bavê şehîd, Ehmed Orhan axîvî.

'Em bi şehîdên xwe serbilindin'

Ehmed Orahan bal kişand li ser bexwedaniya gelê Kurd û wiha got: "Em wek penaberên siyasî her tim bûne hedefa dijmin, berxwedaniya me wisa kir ku dijmin ji me bitirse. Bi dehan balefiran erîşî me kirin, em vê şermezar dikin û dibejin, em Kurdin, nasnama me Kurde, Cil û bergê me Kurdiye, axa ku em li ser jiyan dikin jî Kurdistane. Heta ku yek kes ji me bimine jî emê berxwe bidin û li pey doza şehîdên xwe bin. Em bi şehîdên xwe serbilindin, divê dijminên me serê xwe li hember berxwedaniya Kurdan bi çemîne." Piştî axaftinan serdan bi dirûşmên 'Şehîd namirin' û 'Bijî Serok Apo' bi dawî bû.

***ROJNEWS/Mexmûr***

# Çawîşê Hazna Su kuştî, xwe bi 'Bariş Pinariyê' parast




**Li Qoserê çawîşekî pispor bi wesaiteke artêşê ya bi plakeya Sûriyê pê li Hazna Su ya 52 salî kiribû û kuştibû. Çawîşê pispor paşê bi şertê kontrola edlî hatibû berdan û pişt re şertê kontrola edlî jî hatibû rakirin. Di îdianameyê de hat xwestin ku ji 2 salan heta 6 salan ceza lê bê birîn.**

11'ê Çileya borî li nêzî Girtîgehê ya navçeya Qoser ya Mêrdînê Hazna Su ya 52 salî gava xwestibû derbasî wî aliyê rê bibe, wesaitek lê qelibîbû û jiyana xwe ji dest dabû. Piştî bûyerê kifş bûbû ku wesaita lê xistî ya artêşê ye û plakaya wê jî ya Sûriyê ye û yê li Sûyê qelibandî jî çawîşekî pispor e.

Lê derket holê ku wesaita bi marka Wolksvagen Amaerok ku plakayeke bajarê Helebê ya Sûriyeyê pê ve hatiye kirin, ya Tûgaya Qomando ya 49'an a Çewlikê ye.

Piştî bûyerê çawîşê pispor Bestamî Dûman hatibû binçavkirin û Dadgeriya Ceza ya Sulhê de bi şertê kontrola edlî û qedexeya derketina derveyî welêt berdabû. Piştî Dûman îtiraz kiribû, di 1'ê Sibata 2022'yan de şertê kontrola edlî û qedexeya derketina derveyî welêt jî hatibû rakirin.

**Bi qasî 30 metreyî ew pengizand**

Di zabitnameya cihê bûyerê de hatiye destnîşankirin ku cihê bûyer lê çêbûyî cihê derbasbûna peyayan e û tabele jî lê heye. Di zabitnameyê de hatiye diyarkirin ku gava wesait li Hazna Suyê qelibî Su bi qasî 30 metreyan pengiziye û wesait jî 39 metreyan şûn de sekiniye.

**Paristina bi 'Bariş Pinari Harekati'**

Çendî şahidên li wir gotine ajokar pir bi lez ajotiye jî, lê çawîşê pispor derpêş kiriye ku bi lez neçûye û gava lempeya sor vêketiye bi rê ketiye. Çawîşê pispor Dûman di îfadeya xwe de ev tişt gotine: "Wesaita bi min re paşê kirine wesaita bizirx. Lewma gava min pê li firênê dikir, ji ber hin pirsgirêkên teknîkî yên wesaitê sekinandina wê hinekî zehmet bû. Her wiha ji ber ku paşê veguherandine wesayîteke zirxî dîregên li çep û rastê nahêlin meriv derdorê bibîne. Min di kêliya dawî de maqtûlê dît. Çawa çav pê ketim min pêl firên kir, lê min nikaribû pêşî li ber qezayê bigire. Ez di tevgera Bariş Pinariyê (Kaniya Aştiyê) de me. Ez di tempoyeke zêde de dixebitim."

Serdozgeriya Komarê ya Qoserê derbarê çawîşê pispor Bestamî Dûman de îdianame amade kir. Di dianameyê de hatiye destnîşankirin ku tu qisûreke Huzna Sû tune ye, lê wesayîtê pîvanên trafîkê binpê kirine. Di îdianameyê de hatiye xwestin ku ji 2 salan heya 6 salan ceza li Dûman bê birîn.

***MA / Mêrdîn***

# AZADIYA MIN GIRÊDAYÎ AZADIYA GELÊ KURD E

Roja 15'ê Sibatê ne roja şînê ye; roja derxistina dersê û xwegihandina zanebûna erkê xwe ye. Herwiha roja eşkerekirina komployê ye. Komploya ku dixwazin di şexsê min de pêş bixin, gelek kûr e. Pêvajo hê ne zelal e. Lêbelê em bi aqil û bi zanebûn tev geriyan. Ez li vir her roj di nava berxwedanê de me. Bi sebir û têgihiştineke xurt berxwedaneke mezin dikim. Jîrî û zanebûn serkeftinê jî bi xwe re tînin.

**Komplo hîn neqediyaye û wê berdewam bike!**

Li ser vê bingehê ez komployê hinek vebikim; ev komplo bi durûtiya Ewrupayê ve dest pê kir. Di vê komployê de, jixwe hûn rola Yunanîstanê dizanin. Yunanî ji bo ku me û Tirkan berdin hev, di nav komployê de cih girtin. Rola Yunaniyan, bi zanebûn e. Yunanistan bi Elmanan re, di pêvajoya komployê de li ser bingeha tasfiyeya min hemle pêş xist. Yunanistan, di dema pêvajoya aştiyê ya bi Özal re, bi Îngiltere û Elmanyayê re, xwest ji bû. Lîstikên Elmanya yên li ser Mezopotamyayê, ji mêj ve hene. Di van 20 û 30 salên dawî de jî, dixwaze li ser van listikan bide meşandin. Armanca wan ew bû, ez bême tasfiyekirin an jî min bixin bin kontrola xwe.

Ewrûpa, bi taybetî jî Elman û Îngiliz, tevgereke pak a azadiyê naxwazin. Yunanistan jî bi wî rengî ye. Rusya, di ser min re Projeya Herka Şîn (Mavi Akım) derbas kir û ji IMF'ê kredî standin. Her wiha Îsraîl û Mossad pêvajoya komployê bi rê ve birin û hîn bi leztir kirin. Bi vî rengî hewl da ku Tikiyeyê bixe bin destê xwe. Tiştî ku Ewrûpa anî serê me, ez, wekî ji nû ve çarmîxkirina Îsa dinirxînim. Ewrûpa, li ser bingeha înkarkirina çanda xwe, di şexsê PKK'ê de tengaviyeke mezin û pêncî sal girêdayî derve jiyan bike. Li gorî hesabê li ser min; Yuna-nîstan hin mezin leyist. Encam; wê Tirkiye heta dawî û bi hemû rengan bihata girêdan. Tirkiye naxwaze rastiyan bibîne û fêm bike. Wê şîddet û zorê bisepînin. Ji bo vê, divê mirov berxwedaniyê bi aqilane bimeşîne. Bêguman emê di xeta parastina rewa de bin. Lê, ez dibêjim divê bi zanebûn mirin û kuştin çênebe. Pêwist e, li ser bingeha xeta parastina rewa berxwedan pêk were. Me heta dawî got; aştî û biratî, lê naxwazin fêm bikin. Ev yek jî tê vê wateyê; diyar e ku, li Tirkiyeyê hin kes hene xeterên mezin hildane berçav, ji ber vê yekê jî, wiha tev digerin.



kadroyên xwe, PKK'yek alternatif biafirîne. Hewl dan ku, ji xwe re zilamekî çêbikin, da ku bikaribin ji bo xwe bidin şixulandin.

Elmanya, li dijî me hîn jî hewl dide ku provakasyonan li dar bixe. Pêwist e, mirov vê yekê wiha binirxîne û bi wî rengî tev bigere. Armanca wan ew bû ku; bi kompoloya 9'ê Cotmehê re, me bi gelê Tirk bidin şerkirin. Ev lîstik, versiyona listika sala 1920'an bû. Elmanya di sala 1882'yan de, Îttihat Terakkiyê da ava kir û neteweperestiya Tirkan pêş xist. Mustafa Kemal li derveyî vê xetê polîtikaya Kurd dide meşandin. Di vî warî de çi ji destê wê hat kir. Emerîka jî, min diyarî Tirkiyeyê kir ku, da Tirkiyeyê qezenç bike û her wiha Rojhilata Navîn, Asya Navîn û Balkanan bi xwe ve girê bide.

Di komployê de Tirkiye bi tenê nine; zêdegaviyên hiqûqê yên navnetewî hene. Yunanistan ji derveyê hiqûqê tevgeriya. Li Rusyayê jî, heman tişt pêk hatin. Her wiha Elmanya jî bi wî rengî ye. Ev hemû jî, bi dozê ve têkildar in, ne tenê Tirkiye bi Ewrûpayê ve jî têkildar pêvajoyeke hate jiyankirin.

Di dewleta Tirkiyeyê de çetebûn pêk hatiye. Eger ez bême îmhakirin wê çêbibe? Wê Tirkiye bikeve nav Em dixwazin li Tirkiyeyê, xwedî li gelê xwe der bikevin. Pêwist e, em karê rêxistiniyê hîn bi lez û beztir bikin. Ji ber ku lîstika ku tê meşandin mezin e. Bila gelê me şaş nefikre, wê Tirkiye teqez (ke-sin) biguhere. Tirkiyeyeke demokratîk, tê wateya azadiya gelê me jî. Em azadî û çareseriyê, li deriyê Yekîtiya Ewrûpa û Emerikayê nagerin. Rizgariyê, di demokrasiyê de dibînin. Me du gav avêtin, du agirbest ragihandin û niha jî di xeta parastina rewa de ne.

Em niha dikevin pêvajoyeke awarte. Li gorî min, min Tevgera Kurd xiste riyeke aqilane. Divêyabû vê, coşeke mezin derxista holê. Afrînerî pêwist e. Heyama ku em tê de ne, kordînasyoneke awarte disepîne. Pêwist e, em demê pir baş bi kar bînin. Ji bo ku mirov têk neçe, divê mirov xwedî hêz be. Mirin her dem heye. Mirin ji ku derê tê bila were, ji bo min hîç ne xem e. Dema ku mirov karekî rast kir, wê demê mirin were jî watedar e. Herkes ji bo ku karekî şaş neke, mecbûr e bitirse. Ez bawer im ku hûnê min fêm bikin.

Dibe ku aştî hin baştir jî pêş bikeve. Lê dibe ku mirin jî pêş bikeve. Pêwist e, hûn ji herduyan re jî amade bin. Ez di derbarê nêrînên xwe yên aştiyê de samîmî me. Vê yekê fêm bikin. Eger tiştekî bi min were, wê lêkdan, mirin û kuştin pêş bikeve. Ev jî tê wateya ku, hûnê hemû ji holê bên rakirin. Ev yek eşkere ye. Eger şexsî bûya ezê bimrama. Ku ez bimrim we 50 hezar kes jî bimre. Ji bo ku ez, 50 hezar kes bidim jiyankirin, hewl didim ku xwe rojekê zêdetir bidim jiyankirin. Eger ku mirin hebe jî, ezê bi şiklekî rûmetdar bimrim. Ez di encama komployeyek cihanî de hatim qurban kirin. Ê min bi xwe, tu fikareke min î şexsî nîne. Pêwist e, em li hemberî komplogeran çemka biratiyê pêş bixin.

Ezê heta dawiya nefesa xwe, ji bo xatirê rastiyan jiyan bikim. Eger ez jiyan nekim jî, divê hûn bizanibin ku, ev mirin; çalakiya herî binirx e. Wê demê mirin, a herî binirx û pêwist e. Wê mirin ji bo min ne tenê bibe dema êşê, her wiha bibe dema êş û hezkirinê jî. Ez ji bilî vê, destûra jiyan û mirinê nadim. Azadiya min bi azadiya gelê Kurd ve girêdayî ye. Ji wan re bibêjin; ku em azad bibin emê bi hev re azad bibin, emê bi hev re yekitiya azad bi dest bixin.

Bi ronîkirina vê komployê ve, ez meşa we ya demokratîk ya bêhempa silav dikim. Banga min ji dostan re jî, ew e ku; wekî pêwistiyên dostaniyê, erkên xwe li ser vê bingehê pêk bînin. Ji gelên Tirkiyeyê jî dixwazim ku, xwedî li biratî û demokrasiyê der bikevin. Her wiha ji bo dostên Ewrûpa jî heman tiştan didim diyarkirin.

***Rêber APO***



## Li kû derê alozî hebe AKP li wir e

**Ahmet Aktaş**

Di nava gel de, ji bo kes an jî hêzên wisa çavên wan li der û deverên xerabe, şer û pevçûn lê hebin, dibêjin;"weke gur û qertelên bêhna laş û kelaşa hildane".

Mirov bala xwe dide zihniyet û siyaseta AKP-MHP'ê, mîna vê bivêjê, li kîjan welatî tevlihevî, alozî, şer û pevçûn hebe, ev koma qirker û dagirker berê xwe didin wî welatî. Ji ber ku xwedî zihniyeta wêranê û talanê ye. Jixwe xwediyê dîrokeke wisa ye û tew xwe bi wê dîroka xwe ya lewitî û xwînrêj pesnê xwe didin!

Nêzî salekê ye, welatên wisa li gorî dilê rêveberên AKP-MHP'ê dixwestin nemabûn. Lê dîsa li hinek welatan; weke Efxanistan, Ukrayna û vê dawiyê dîsa Libya'yê alozî, şer û pevçûn derketin, hema berî her dewletê, mîna Qertelên Laşxurê bêhn hilanî, berê xwe dan van welatan.

Li gorî tê xuyakirin, dibe ku li Efxanistanê pariyekî piçûk li froşgahê bi dest xistibe, lê li Ukaynayê ti hêvîya wan xuya nake. Ji ber ku li ser wî laşî dewletên cihanê yên sereke DYA û Rûsya, xwe dikin xwedanê wir û xwedê zane ti pariyan naxin devê ti kesên mîna AKP-MHP'yan!

Bi tenê niha tama devê xwe li Libyayê xweş dikin. Ji ber li wir aloziyê rû da, ew pêkhatina Rêveberiya Yekîtiya Neteweyî ya A.Dibeybe têk diçe. Li Tobrukê, Meclîsa Neteweyî li hev kom bû, A.Dibeybe daxist, li şûna wî Fethi Başaxa wek Serokwezîrê Libyayê hilbijart.

Lê alozî gurtir bû. Ji ber ku niha 2 Rêveberî û 2 Arteş hene li Libyayê. Yek ya Dibeybe li Trablûsê, dudu ya Başaxa li Tobrûkê.

Hema piştî vê bûyerê nîşanên qeyrana mezin hatin diyarkirin: Êrîşên kuştina her du rêberan jî; hem li ser Dibeybe û hem li ser Başaxa pêk hatin.

Dewleta despêkê ya Tirkan bû ku bertek nîşan da û li gorî saloxan, komên kujerên nû ji Sûriye û ji Rojava şandine Libyayê. Herwiha wê şandeyeke siyasî ya dewleta xwe jî bişîne.

Belê li gorî rewşa heyî, şensê serkeftina AKP-MHP'ê diyar nake. Ji ber ku jixwa ji mêj ve ye ew û "dostê" xwe Rûsya, li gelek deveran hatine hemberî hev: Ji despêkê ve li Sûriyeyê, li pey wê li li Libyayê, Qerebaxê û hwd.

Dibe ku ya herî dawî û herî dijwar li Ukraynayê hatin hemberî hev. Li gel ewqas nakokî û dijberiyên giran, niha jî li Libyayê bû cara duduyan ku tên hemberî hev. Helbet xerabûna hevkariya wan, ji bo Kurdan nexasim ji bo Rojava bi xêr e!

Herwiha, ew û Îran jî hatin hemberî hev; hem li Sûriyê, hem jî li Iraq û Efxanîstanê. Helbet bi vê ve girêdayî ew sêqoliya wan ya ASTANA û SORÇÎ sar bûye, êdî dibe ku nemeşe jî. Mînaka herî dawî jî li Stenbolî MITê êrîş bir ser nivîsgeha Istixbarata Îranê û 14 kes hatine girtin jî.

Li gel vê, bi rêya Nêçîrvan Berzanî dest avêtiye rêveberiya Bexdayê jî. Ji vê hewldanê Îran nerazî ye û ji bo têk bibe Fermandarê Hêza Qudsê General Ismail Kanî (Şûngirê Silêman Qasimî ye) şand Necefê û Hewlêrê!

Ev sergêjiyên rêveberiya AKP-MHP'ê ne bes bû niha bûyera li Qibrisa Tirkan kuştina Xelîl Balyali bi ser ve hat! Hema hema dişibe Bûyera Susurlukê. Li vir jî hevkariya dewletê, siyasetê û mafyayê careke din aşkere û zelal derket holê.

Ji her alî ve diyar dibe ku rêveberiya AKP-MHP'ê ber bi ketinê ve diçe. Aloziyên Libya û Ukraynayê jî têra rizgariya wê nake!



# `Ji bilî têkoşînê ti rê li pêşiya me nînin`

Elya Oxlo teqez kir ku êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê berdewamiya Komloya Navneteweyi ya 15 Sibatê ne û got, bi armanca qirkirina gelên herêmê û têkbirina projeya biratiya gelan, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe li ser herêmên domîne.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û kiryarên hovane, herwiha komkujiyên li ser gelên herêmê berdewam in. Rêvebera komîteya lihevanînê ya bajarê Til Temir Elya Oxlo derheqê êriş û planên ku niha Tirkiye li Rojava pêk tîne, domandina siyaseta wê ya qirêj e, herwiha li ser domndina Komploya Navneteweyî ji me re axîvî.

**`Êrişên niha berdewamiya komployê ne`**

Elya Oxlo teqez kir ku tiştên niha diqewimin, berdewamiya komploya navneteweyî ne û wiha domand: "Tirkiye dixwaze destkeftiyên gelê Kurd têk bibe, herwiha projeya Neteweya Demokratîk û biratiya gelan bêbandor bike. Yê ev proje danî Rêbertî bû. Ji bo wê jî têkiliyên gel û rêbertiyê qut kirine; bi tecrîda girankirî kiryarên dijmirovî dike. Li dijî vê em jî dibêjin em şagirtên Rêber Apo ne. Ew çiqas tecrîdê giran bikin û êrişan zêde bikin, emê jî li hemberî wan hê zêdetir gavên xurt biavêjin. Ti kes nikare me ji rêberê me qut bike, wê têkoşîna me bênavber dewam bike. Emê her roj dengê xwe bigihînin gelên cîhanê û emê bi yekgirtina gelan bi ser bikevin."

Elya axaftina xwe wiha domand: "Rojane êriş li ser herêmên me hene. Jixwe bajarê me nêzî bajarên dagîrkirî ye. Ji ber wê jî em her roj êrişan dibînin. Her gavê balafirên Tirkiyê li ser asîmanê bajarê me digerin. Gelek gundên ku bi Til Temir ve girêdayî ne hatine bombebarankirin. Dewleta tirkî ya dagîrker dema ku bajarekî dagîr dike, dikeve malên welatiyan, mal û milkên wan talan dike û wan neçarî koçberiyê dike."

**`Li hemberî êrişan bêdengiya dewletan domandina komloyê ye`**

Elya da xuyakirin ku bêdengiya dewletan tê wateya domandina komployê, da ku projeya Neteweya Demokratîk û Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê bêbandor bikin û vîna gelê Kurd bişkînin.

Elya wiha dawamî da gotinên xwe: "Tevayiya pêkhateyên me yên li Til Temir li hemberî dagîrkeriyê yekdest in. Ji bo wê jî wê biratiya gelan derfetê nede Tirkiyê ku planên xwe pêk bîne. Bajar û herêmên me bi xwîna şehîdan hatine avdan. Emê li dû vê şopê bin û girêdayî xaka xwe bin. Ji bilî têkoşênê ti rê li pêşiya me nînin. Emê li ber xwe bidin heta ku dagîrkeran têk bibin."

**`Em vegera rejima Sûriyê qebûl nakin`**

Li ser helwesta hikûmeta Şamê û helwesta dewletên garantor yên weke Rûsya û Emerîka Elya got, bi helwesta hikûmeta Şamê diyar e ku ti carî nexwestiye bi Rêveberiya Xweser re danûstandinan bike. Lewra heta niha zihniyeta xwe ya şovenîst neguhertiye. Herwiha dix-



waze Sûriyê vegerîne berî 2011'an. Wek gelê bakur û rojhilatê Sûriyê û dayîkên şehîdan, em qebûl nakin ku careke din desthilatdariya Be`sê vegere herêmên me. Me rêveberiya xwe ava kiriye û em tev di rêvebirin û parastina herêmên xwe de hevpar in.

Rêvebera komîteya lihevanînê ya bajarê Til Temirê Elya Oxlo di dawiyê de bang li gelê bakur û rojhilatê Sûriyê kir ku li dijî Komploya Navneteweyî têkoşîna xwe zêdetir bikin û li rêberê xwe xwedî derkevin. Da ku sala 2022'an bibe azadiya Rêber Abdullah Ocalan û binketina planên Tirkiyê.

# Mahmoud Patel: Divê bi Rêber Ocalan re hevdîtinên aştiyê dest pê bikin

**Prof. Mahmoud Patel got, divê hêzên komploger wek nîşana niyeta baş daxwaziya azadkirina rêber Abdullah Ocalan bikin. Herwiha got, erdê Afrîkayê ji bo ku Komploya Navneteweyî rewa bikin, hat bikaranîn.**

Ji kesên ku paradîgmaya Rêber Abdullah Ocalan wek çirûskeke hêviyê dibînin, Mahmoud Patel yê ji Afrîkaya Başûr e. Patel dibêje gelê wî Rêber Ocalan wek yekane hêza pêkanîna aştiyê ya li herêmê dibîne.

Serokê Koma Çalakiyê ya Kurd ya Mafên Mirovan ya Afrîkaya Başûr Prof. Mahmoud Patel bi pêmana salvegera komployê ji ajansa me re axivî.

**DEMA KU LI BENDÊ BÛN HERE AFRÎKAYÊ, KOMPLO ÇÊBÛ**

Patel diyar kir ku girtina Rêber Abdullah Ocalan di encama Komploya Navneteweyî de li Kenyayê bandoreke neyînî li gelê Kenyayê û gelê Afrîkayê kir û diyar kir ku gelek xemgîn bûn dema ku bihîstin Rêber Abdullah Ocalan dîl hatiye girtin ku dihat payîn mafê penaberiya siyasî li Afrîkayê jê re were dayîn.

Patel got pişt re pê zanîne ku di mijara dîlgirtina Rêber Ocalan de CIA, MI6, Mossad û rayedarên Kenyayê alîkarî dane MÎT'ê û hê jî nayê zanîn ka çima hikumeta wê demê li pêşberî vê mijarê bêdeng maye.

Patel da xuyakirin ku di daxuyaniya wezîrê karên derve yê Kenyayê Bonaya Godana ya têkildarî Rêber Abdullah Ocalan de hat diyarkirin ku welatê wî ti rol nelîstiye lê çavkaniyên Kenyayê ji ajansên nûçeyan re diyar kirine ku serok Daniel Arap Moî yê ku dixwest bi DYA'yê re têkiliyên baş bidomîne û ev yek daxuyaniya Godana bêwate dike ku ferman daye ku Rêber Ocalan radestî MÎT'ê were kirin.



**ÇIMA NAÎROBÎ HAT HILBIJARTIN?**

Mahmoud Patel sedemên ku hêzên navneteweyî Naîrobî wek bajarê dawî ji bo dîlgirtina Rêber Abdullah Ocalan hilbijartine, wiha tîne ziman: "Ewropiyan û dostên sexte nexwestin li ser erdê xwe bigirin. Wekî ku di sala 1999'an de di rojnameya Los Angeles Times de hat ragihandin, ev zexteke Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) bû ku helwesta Tirkiyê di nava NATO'yê de nîşan dida. Erdê Afrîkayê ji bo ku Komploya Navneteweyî were rewakirin hat bikaranîn."

**NÊRÎNA GELÊ AFRÎKAYÊ JI RÊBER OCALAN RE; HÊVIYEK E**

Li Afrîkaya Başûr, Koma Çalakiyê ya Kurdan a Mafên Mirovan, saziyên din ên mafên mirovan, sendîka û Partiya Komunîst a Afrîkaya Başûr bi salan e ji bo azadiya rêber Abdullah Ocalan xebatên lobiyê dikin. Patel destnîşan kir ku keda wan a ji bo azadiya fîzîkî ya rêber Abdullah Ocalan, erkeke exlaqî û polîtîk e û wiha axivî: "Bi giştî hemû rêxistinên mafên mirovan Rêber Ocalan ji bo gelên bindest ên Kurdistanê wek hêviyê dibînin. Ez jî wisa dibînim. Gelê Afrîkaya Başûr, rêber Ocalan wek rêberê rewa yê gelê Kurd û mifteya aştiyê ya li herêmê dibîne."

Patel têkoşîna gelê Kurd û ya gelên bindest ên Afrîkaya Başûr şibandin hev û destnîşan kir ku her du gel ji azadî û mafên bingehîn li welatên xwe bêpar hatine hiştin û got: "Bi rêya ANC û PAC'ê li gelê bindest ê Afrîkaya Başûr, hem jî gelê Kurd bi rêya PKK'ê têkoşîna çekdarî ya rizgariyê meşand. Nelson Mandela ji bo ku têkoşîna çekdarî bi rê ve bibe, dest bi xebata veşartî kir û ji aliyê rêxistinên îsrîxbaratê yên DYA'yê ve rastî xiyanetê hat. Abdullah Ocalan jî rastî xiyaneta DYA, Brîtanya û Îsraîlê hat. Ew her du jî li giravan bûn; Mandela li girava Robbenê, rêber Ocalan jî li girava Îmraliyê."

**'HIQÛQA XWE BI CIH BÎNIN!'**

Mahmoud Patel xuya kir ku ji bo bicihanîna edaletê ji rêber Ocalan û gelê Kurd re, divê hêzên komploger demildest bikevin nava hewldanan û got: "Divê hêzên komploger wek nîşandana niyeta baş, tavilê serbestberdana rêber Ocalan bixwazin."

Patel diyar kir ku dem hatiye ku bang li Tirkiyê bikin ku di çarçoveya hiqûqa navneteweyî de wezîfeyên xwe bi cih bîne û bi taybetî li gorî peymanên Neteweyên Yekbûyî yên ji aliyê Tirkiyê ve jî hatine îmzekirin û wiha lê zêde kir: "Divê hevalbendên NATO'yê hesabê Tirkiyê bikin û berjewendiyên xwe nexin pêşiya azadî û demokrasiyê ji bo Kurdan, di nav de azadiya rêber Ocalan jî."

**'IŞKENCEYA HERÎ XIRAB E'**

Patel rapora raportorê taybet ê Neteweyên Yekbûyî Juan Méndez a di Cotmeha 2011'an de pêşkêşî Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî kiribû, bi bîr xist û diyar kir û got:"Îşkenceyeke herî xirab e. Ji bo aştî û aramiya li Tirkiyê û herêmê, divê NY bi lezgînî şertên girtîgehê yên Abdullah Ocalan lêkolîn bike û divê Komîteya li dijî Îşkenceyê were seferberkirin."

Patel diyar kir ku rêber Abdullah Ocalan nûnerê gelê Kurd e û dikare li Tirkiye û herêmê rê li ber aştiyê veke. Patel diyar kir ku li ser bingeha tecrubeya welatê wan, serbestberdana lîderekî rewa û pêbawer, mecbûrî ye û ji bo pêvajoyeke aştiyê şertekî pêwîst e û got: "Daxwaza azadiya rêber Ocalan rewa ye."

Serokê Koma Çalakiyê ya Kurdan a Mafên Mirovan a Afrîkaya Başûr Prof. Mahmoud Patel her wiha diyar kir ku bi azadiya fîzîkî ya rêber Abdullah Ocalan re, rêber Ocalan wek mirovekî azad dê bikare bi dewleta Tirk re dan û standinan bike. Patel got divê ev dewlet bi awayekî komî bang li Neteweyên Yekbûyî bikin ku ji bo hêsankirina hevdîtinên aştiyê însiyatîfekê bidin destpêkirin û Tirkiyê vexwînin pêkanîna erkên xwe yên li gorî hiqûqa navneteweyî.

***ANHA***

## Krîza Ukrayna bandora xwe pir dike

**Zekî Bedran**

Pirsgirêka Ukrayna niha bûye rojeva yekê ya dinyayê. Berî niha jî Rûsya Kirim bi ser welatê xwe ve kiribû. Ciyên Rûs lê heyîn ragihandina xweseriyê hebû. Lê di vê astê de nebûbû rojev.

Niha çima evqas bû rojev? Bi tayberî Amerîka daxuyaniyên wisa dide ku wê îro sibê Rûsya êriş bike û Ukrayna dagîr bike. Vê firset dibine û Polonya jî di navê de leşker dişine Ewropa û li Ukrayna jî bi çekan dadigire. Rûsya jî dibêje Rojava li dijî me şerê propagandayê dike û daxuyaniyên ku planeke wan ya dagîrkirina Ukrayna nîne dide. Lê Amarîka û hevalbendênwê guhê xwe nadin van daxuyaniyan. Li hemberî hev tevgerên leşkerî jî dikin. Di çapemeniyê de wisa tê dîtin.

Rûsya dibêje bila NATO neyê ber deriye em û Ukrayna jî nexin nava NATO. Herwisa dibêje NATO me dijmin dibine û me dorpêç dike. Çawa ku tê zanîn bi belavbûna Sovyetan re Yugoslavya û welatên Balkan nêzîkî Rojava bûn. Parvekirina Yugoslavya bixwîn bû. Li herêmên weke Bosna-Hersek komkujiyên weke qirkirinê çêbûn. Halbiku ev gel heta wê rojê bi hev re bûn. Çawa bû ku di demeke wisa kurt de bûn dijminên hev. Bi hilweşîna Sovyetan hevsengiya piştî şerê cîhanê yê 2. ava bûyî ji holê rabû. Sîstema emperyalist ciyên vala bûyîn xwest li gorî berjewendiyên xwe serrast bike. Tiştên niha li Ukrana dibin domandina wê parvekirin û serrastkirinê ye. Ji bo wê Rûsya Ukrayna ji bo ewleyiya xwe herêmeke krîtîk dibine. Amerîka û NATO jî dixwazin Rûsya tengav bikin û nehêlin ji sînorê xwe derbas bibe.

Dinyaya Rojava herî zêda Rûsya di warê aborî de tehdîd dike. Aboriya Rûsya li gorî ya Rojava lewaz e. Amerîka û Ewropa di warê aborî de Rûsya pir tengav bikin. Amerîka di eniya dijberê Rûsya de serkêşiyê dike. Lê dibêje ez li Ukrana leşkerên xwe naxim nava şer. Ka wê şerê navxweyî derkeve yan na nayê zanîn. Ya rast rewşeke ku şer neçar jî dike nîne. Eger Amerîka û NATO fikarên Rûsya li ber çavan bigirin pirsgirêk namîne. Lê Amerîka û NATO dixwaze ji Rûsya re bêje li ciyê xwe raweste û sînorê xwe nas bike.

Di serî de Amerîka û Rûsya hêzên bibandor yên dinyayê li Sûriyê ne. Di aliyekî de dijminê wan yek bû. Di hedefa destpêkê de hêzên dijmirovî yên weke DAIŞ`ê û El Nusra bûn. Îranê û Rûsya li cem rêveberiya Şamê ciyê xwe girtin. Eger ne ji wan buya rêveberiya Esed nedima. DAIŞ`ê deverên weke Reqqa û Dêrazorê xistibûn deste xwe. Wê heta Şamê biçûya. Lê piştî ku bere xwe da Kurdan rewşeke cuda derket holê. Kurdan li Kobanê berxwedaneke dîrokî kir. Amerîka û koalisyonê derveyî Kurdan hêzeke li ber xwe bide û li hemberî DAIŞ`ê şer bike nedîtin. Ceribandinên wan yên destpêkê encam negirtin. Ji bo wê di rojên dayî yên berxwedana Kobanê de tevlî şer bûn. Heta şkandina DAIŞ`ê vê dewam kir. Hêzên Amerîka û koalisyonê jî hatin Sûriyê. Amerîka û Israîlê li aliyekî jî Îran kirin amanc. Israîlê di heman deme de bi Rûsya re gelek hevdîtin kirin. Di lêxistina Îranê û Sûriyê de Rûsya bi giranî bêdeng ma. Rûsya hevalbenda Şamê ya stratejik bû. Digel wê Kurdan û hevalbendên wan qebûl kirin ku Rûsya di navbera wan û Şamê de navcîtiyê bike. Rojava û herêmên xweser ji ber ku alîgirên yekbûna Sûriyê bûn di navcîtiya Rûsya de ti pirsgirêk nedîtin. Lê dijberiya Rûsya ya li hemberî Amerîka hebû. Weke din dijberiya Îranê jî ya li hemberî Amerîka habû. Heta hindik mabû şerê hev bikin.

Rojava û herêmên xweser di binê tehdîdeke mezin de bûn. Tirkên dagîrker bênavber êriş dikirin. Ji bo Efrîn û Serê Kaniyê bi Rûsya re li hev kir û ew herêm dagîr kirin. Kurd her tim bi Rûsya re di nava danûstandinê de bûn. Lê di hevdîtinên bi Şamê re ti pêşketin çênebûn. Rûsya giraniya xwe dananî. Kurdan nexwest di nakokiyên di navbera Amerîka, Rêsya û Îranê de bibin teref û hê jî wisa dikin. Barê herêmên xweser giran e. Di binê gef û dorpêçê de ne. Naxwazin bibin aliyekî nakokî û şer. Digel wê rêveberiya Şamê herêmên xweser bi ajantiyê sûcdar dike. Halbiku eger herêmên xweser DAIŞ neşkandibûna Şam li ser piyan nedima.

Amerîka nabêjin divê li Sûriyê rêveberiya Şamê bê guhertin. Dengê xwe ji bandora Rûsya ya li Sûriyê re jî nakinn. Lê eger li Ukrana rewş xerbtir bibe, wê Rûsya nikaribe li du eniyan heman bandorê bike. Aboriya Rûsya nikare vê rake. Li aliyê din aboriya rêveberiya Şamê jî pir xerab e. Ji bo wê geşedanên dibin wê di gelek aliyan de bandorê li Sûriyê bikin. Em hêvî dikin kriz kûrtir nebe û rê ji dewletên keysbaz yên weke Tirkiyê re neyê dayîn.